# SERDEMA XALIDÎTIYÊ DI TARÎXA EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK DE

ABDURRAHMAN ADAK*



Mela Ehmedê Xasî

## DESTPÊK

Mirektiyên Kurdan, ku piştî dawîlêhatina dewleta Ebasiyan û hikûmetên Kurdan di sedsalên XIIIem û XIVem de li deverên curbicur ên Kurdistanê hatibûn damezirandin, teqrîbî piştî 700 salî, di nîveka sedsala XIXem de ji aliyê Osmaniyan ve ji holê hatin rakirin. Di serdema mîrektiyan de Kurd xwedîyê statuyeke siyasî bûn. Lêbelê dema dawî li mîrektiyan hat ev statu ji holê rabû û statuyeke nû nehat bidestxistin. Herçiqas Osmaniyan di vê serdemê de li hemberî Kurdan siyaseta merkezîbûnê meşandin û di vê çarçoveyê de eyaleta Kurdistanê ava kirin jî, ev sîstema nû ya siyasî bi ser neket û li Kurdistanê ji aliyê desthilatdariya siyasî ve valahiyeke mezin rû da. Lêbelê di vê qonaxê de di nav civaka Kurdan de bizaveke dînî-tesewufî belav dibe ku ev bizav vê valahiyê bi tevahî dadigire. Ev bizav jî "Neqşebendîtiya Xalidî" ye ku di dawiya mîrektiyan de ji aliyê Mewlana Xalidê Şarezorî (k.d.1826) ve li Silêmaniyê hatiye damezirandin. Xalidîtî bi taybetî bi riya tekyayên Tewîle/Beyara, Basret, Nehrî û Palo wek tevnekê li seranserê Kurdistanê belav dibe û li her devereke Kurdistanê nûnerên (xelîfeyên) ku bi van şaxan ve girêdayî derkevin meydanê. Dema ku dawî li mîrektiyên Kurdan hat, ev bizav jixwe li Kurdistanê belav bûbû, lêbelê dawîlêhatina mîrektiyan û aloziyên civakî pêşiya wê bêtir vekir û ji bo belavbûneke zêdetir û bidestxistina hêzeke mezintir şertûmercên guncaw çê bûn. Xalidîtiyê, bi riya van tekyayan ji nîveka yekem a sedsala XIXem heta bi dawîlêhatina Dewleta Osmanî -nêzî sed salî- (1826-1923) li Kurdistanê desthilatdariyeke dînî, perwerdeyî, civakî û sîyasî bi dest xistiye.

Bi awayekî siruştî vê rewşa siyasî-civakî ya nû rengê xwe daye edebiyata Kurdî jî. Lewra piştî ku mîrektî ji holê rabûn medreseyên wan jî ji holê rabûn. Êdî şûna medreseyên mîran medreseyên Xalidiyan hebûn. Kesên ku di van medreseyan de dixwendin di bin hîmayeya nûnerên Xalidiyan de diman û piraniya wan dema medrese

xilas dikirin dest bi nûnertiya Xalidîtiyê dikirin. Vê serdemê edebiyata Kurdî ya klasîk di van medreseyan de hebûna xwe domandiye. Dikare bê gotin ku tevahiya helbestvanên vê serdemê yan nûnerên Xalidîtiyê ne, yan pêgirtiyên wê ne, yan jî qet nebe di medreseyên wan de di bin hîmayeya nûnerên Xalidiyan de perwerde dîtine. Ji ber vê yekê jî em vê qonaxa tarîxa edebiyata Kurdî wek serdema Xalidîtiyê dikarin bi nav bikin.

Qonaxa Xalidîtiyê di tarîxa edebiyata Kurdî de li ser êwran dikare bê dabeşkirin: Serdema Mewlana Xalid, ji Mewlana Xalid heta bi şerê cîhanê yê yekem û piştî şerê cîhanê yê yekem. Li jêrê em dê di çarçoveya van êwran de pêwendiya Xalidîtî û edebiyata Kurdî ya klasîk bi perspektîfa tarîxa edebiyatê raxin ber çavan.

## 1. SERDEMA MEWLANA XALID

Ji ber ku Xalidîtî bi **Mewlana Xalid** (k.d.1826) dest pê dike, bi awayekî siruştî divê em mijarê bi Mewlana Xalid û serdema wî bidin destpêkirin. Dema em li Mewlana Xalid dinêrin, em dibînin ku hilberîna wî ya edebî herî zêde bi farisî ye. Dîwana wî ya farisî li medreseyên Xalidiyan, di çarçoveya Bakur de bi taybetî li medreseyên şaxa Nehrî, gelekî belav bûye. Ji Mewlana Xalid tenê çend helbestên bi Kurdiya Hewramî gihiştine me. Bi qasî ku tê dîtin di serdema Mewlana Xalid de pêgirtiyên wî yên ku bi edebiyatê re mijûl bûne ne zêde ne. Bêguman ev tiştekî siruştî ye. Lewra serdema Mewlana Xalid serdema avakirina Xalidîtiyê ye û di demeke zû de pêşketineke edebî ya bihêz jixwe nayê hêvîkirin. Lêbelê digel vê jî em dibînin ku helbestvanekî wek **Siyahpoş** ku bi *Seyfu'l-Milûk*a xwe yek ji helbestvanên herî girîng ê dawiya mîrektiyan e, bûye pêgirtiyekî Mewlana Xalid. Em vê yekê ji mersiyeya wî ya bi erebî ku li ser mirina Mewlana Xalid nivîsiyê fêm dikin. Çawa tê zanîn Siyahpoş di jiyana xwe de li cihekî sabit nemaye û jiyana xwe li gelek deveran bûrandiye. Wisa xuya ye ku di vê çarçoveyê de xwe gihandiye Mewlana Xalid û bûye pêgirtiyekî wî.

Mewlana Xalid nûnertiya Xalidîtiyê (xelîfetî) daye gelek kesan ku ji wan navên 96 heban hatine tesbîtkirin. Lêbelê pêwendiya van xelîfeyên wî bi edebiyatê re zêde ne zelal e û di vî warî de pêdivî bi lêkolîneke taybet heye. Vê kêliyê tişta em dizanin ew e ku ji xelîfeyên Mewlana Xalid **Seyîd Ebdulahê Nehrî** (k.d.1813) ku damezirînerê tekyaya Nehrî ye, bi navê *Xulasê Eqaid*ê berhemeke pexşan bi Kurdiya Kurmancî nivîsiye. Berhema ku li ser zanyariyên dînî ye û di sala 1339/1920an de li Stenbolê ji aliyê Ehmed Ramiz ve hatiye çapkirin, di warê pexşana Kurdî de girîng e.


## 2. JI MEWLANA XALID HETA BI ŞERÊ CÎHANÊ YÊ YEKEM

Belavbûna Xalidîtiyê zêdetir piştî Mewlana Xalid çê bûye. Bi taybetî ji Mewlana Xalid heta bi şerê cîhanê yê yekem ku beramberî serdema dawî ya Osmaniyan tê, Xalidîtî gelekî belav bûye û ev serdem wek serdema zêrîn a Xalidîtiyê dikare bê nirxandin. Edebiyata Kurdî ya klasîk jî di vê serdema Xalidîtiyê de gelekî pêş ketiye. Li jêrê em dê di çarçoveya şaxên sereke yên Xalidîtiyê de li pey şopa edîbên Xalidî yên vê serdemê bigerin.

**2. 1. Şaxa Nehrî**

Nehrî, li herêma Hekarî gundekî nêzîkî Şemzînanê ye. Şaxa Nehrî ya Xalidîtiyê li vî gundî derketiye holê û bûye şaxa herî berbelav a Xalidîtiyê. Şaxa Nehrî pêşî li herêmên Hekarî, Wan, Bedlîs û Barzanê belav bûye; piştre jî gihîştiye heta bi herêma

*Şema 1:*
**HELBESTVANÊN MALBATA MELA EBDULLAHÊ SEMERŞÊXÎ**



Diyarbekirê, Kurdistana Surî û Rojavayê Tirkiyê. Damezirînerê vê şaxê Seyîd Ebdulahê Nehrî (k.d.1819) ye û ji Mewlana Xalid xelîfetî stendiye.

Çawa ku li jorê derbas bû **Seyîd Ebdulahê Nehrî** bixwe bi navê *Xulasê Eqaid* berhemeke pexşan nivîsîbû. Piştî Seyîd Ebdulahê Nehrî biraziyê wî Seyîd Taha (k.d.1852) li Nehrî dibe postnişîn û di belavbûna Xalidîtiyê de roleke girîng dilîze. Bandora wî ewqas zêde çê dibe ku du helbestvanên girîng ên dawiya mîrektiyan ku di heman demê de rêvebirên mîrektiyên wê herême ne dibin pegirtiyê wî. Yek ji wan mîrê mîrektiya Hekarî **Pertew Beg e** û yê dî jî katibê mîrektiya Miksê **Weda'î** ye ku her du jî helbestvanên xwedî dîwan in.


Piştî Seyîd Taha kurê wî Şêx Ubeydullahê Nehrî (k.d.1883) ku bi serhildana xwe navdar e dikeve şûna wî. Şêx Ubeydullah, herçiqas di farisî de mesnewiyeke girîng nivîsîbe jî, bi kurdî tiştek nenivîsiye. Bandora Şêx Ubeydullah digihîje heta bi Mehabadê û **Wefayî** (k.d.1902) ku yek ji nûnerên girîng ê edebiyata Soranî ye ji Mehabadê tê Nehrî û dibe pêgirtiyê Şêx Ubeydullah. Wefayî demeke dirêj (tev de çardeh salan) li tekyaya Nehrî maye û di dîwana xwe ya bi Soranî de gelekî cih daye Şêx Ubeydullah û tekyaya Nehrî.

Ji xelîfeyên Seyîd Taha Seyîd Sibxetullahê (k.d.1870) Arwasî û Seyîd Fehîm Arwasî (k.d.1895) şûnde, Xalidîtî li Bedlîs û derdora wê (Miks, Hîzan, Norşîn, Mutkî, Lice) belav bûye, di bin hîmayeya nûnerên wan de gelek medrese ava bûne û ji ber vê jî li van deveran jimara helbestvanên Xalidî zêde bûye. **Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî** ku li Bedlîsê li cem Şêx Fethullahê Werqanisî (k.d.1899) xwendiye, helbestvanekî xwedî dîwan e. Dîwana wî ji helbestên Erebî, Farisî, Tirkî û Kurdî pêk tê. **Xelîfe Selîm** (k.d.1914) ku ji devera Kanîreşa Çewlikê ye û li Hîzanê ji kurê Seyîd Sibxetullahê Arwasî Şêx Nûr Mihemed xelîfetî stendiye, helbestvanek e ku çend helbestên wî gihîştine roja me û Cegerxwîn jî helbestvaniya wî pesinandiye. Çawa tê zanîn Xelîfe Selîm di sala 1914an de li dijî Osmaniyan digel Şêx Şehabedîn û Seyîd Elî serhildaneke leşkerî pêk anîye û di encamê de hatiye bidarvekirin. **Şewqiyê Xanî** ku di nîveka duyem a sedsala XIXem de jiyaye Xalidîtiya xwe di kunyeya xwe de aşkera îfade kiriye: Mela Mihemed Şewqiyê Colemêrgîyê Xaniyê Xalidî. Şewqî helbestvanekî xwedî dîwan e, lêbelê dîwana wî bi piranî bi farisî ye. Ji Şewqî bi Kurdî çend helbest û menzûme gihîştine me.


Komek ji helbestvanên Xalidî ji **malbata Mela Ebdullahê Semerşêxî** (k.d.1854) ne. Mela Ebdullahê ku ku xelkê Hîzanê ye û piştre li Semerşêxê bi cih bûye, xelîfeyekî Mewlana Xalid e. Mela Ebdullah bixwe ne helbestvan e, lêbelê ji malbata wî şeş helbestvan derketine: Mela Evdirehmanê Melakendî (k.d.1874), Şêx Evdilqadirê Hezanî (k.d.1905), Mela Îbrahîmê Çoqreşî (k.d.1881), Şêx Es'edê Çoqreşî (k.d.1902), Şêx Yehyayê Çoqreşî (k.d.1964) û Şêx Ismetullahê Karazî (k.d.1996).

Ji van helbestvanan Mela Evdirehman ber bi jor ve diçe û li Melakenda Mûşê bi cih dibe, kurên wî Mela Îbrahîm û Şêx Es'ed jî berjortir diçin û li Çoqreşa Qereyaziyê (Erzurum) bi cih dibin. Şêx Evdulqadir jî berjêr tê û li Hezana Diyarbekirê bi cih dibe. Tevahiya van helbestvanan ji aliyê tesewifî ve pêgirtiyên Şêx Evdirehmanê Taxî ne. Di nav wan de yê herî girîng Şêx Evdulqadirê Hezanî ye. Lewra wî bi qasî dîwanekê helbest nivîsîne. Lêbelê qewareya wan ne wek hev jî be, ji yên dî jî helbest gihîştine me. Helbestên wan bi piranî di çarçoveya edebiyata tekyayê de ji medhiye û mersiyeyên li ser nûnerên Xalidîtiyê pêk tên.

*Şema 2:*
**ŞÊX EBDULQADİRÊ HEZANÎ Û XWENDEKAR Û XELÎFEYÊN WÎ YÊN HELBESTVAN**




*Şema 3:*
**ŞEMA 3: ŞÊX EVDİREHMANÊ AQTEPÎ HELBESTVANÊN MALBATA WÎ**



Di nav peyrewên Şêx Evdulqadirê Hezanî de jî nerîta helbestvaniyê dewam kiriye. Xwendekar û xelîfeyên wî **Seydayê Licî** (k.d.1911), **Şêx Mustafayê Sîsî** (k.d.1914) û **Mela Ehmedê Xasî** (k.d.1951) helbestvanên girîng in. Dema Şêx Ebdulqadirê Hezanî wek xelîfeyê Şêx Evdirehmanê Taxî li Hezana Licê bi cih dibe û li wir dest bi nûnertiya wî dike, Seydayê Licî ku li Licê muderris e, vê yekê dibihîze û xwendekarê xwe Mistefayê Sîsî, ji bo çavdêrî û naskirinê dişîne Hezanê. Piştî ku Mistefayê Sîsî, Şêx Evdilqadir nas dike biryar dide ku bibe pêgirtiyê wî. Piştre Seydayê Licî jî dibe pêgirtiyê wî. Di encamê de her du dibin xelîfeyên wî jî. Lêbelê divê bê gotin ku hem di nav van her sêyan de, hem jî di nav hemû helbestvanên Xalidî yên ku di hînterlanda Taxî de ne, yê herî girîng Seydayê Licî ye. Seydayê Licî hem dîwanek li pey xwe hiştiye û hem jî di çarçoveya helbesta dîdaktîk a dînî de menzûmeyeke tecwîdê nivîsiye. Şêx Mustafayê Sîsî li ser daxwaza şêxê xwe ji Licê koçî Qewmana Qereqoçanê kiriye û li wir bi cih bûye. Pey wî re kurê wî **Şêx Mihemed Hadiyê Qewmanî** (k.d.1956) bûye postnişîn. Ji her duyan jî mîqdarek helbest gihîştine me. Xaleke dî ya balkêş ew e ku Seydayê Licî û xwendekarê wî Şêx Mustafayê Sîsî bi eslê xwe xelkê Silêmaniyê ne û pismanê hev in. **Şêx Ubeydullah Şewqî** (k.d.1919) jî xelîfeyê Şêx Mistefayê Sîsî ye û li ser wî hin medhiye nivîsîne. Heçî Seydayê Xasî ye, ew ji karên terîqetê zêdetir bi karên perwerdeyê re mijûl bûye, lêbelê divê neyê jibîrkirin ku ew jî xelîfeyekî Hezanî ye. Xasî, bi mewlûda xwe di Kurdiya Zazakî de yekem berhema nivîskî û edebî pêşkêş kiriye.

Xelîfeyekî Şêx Evdirehmanê Taxî jî Şêx Evdilqeharê Zoqeydî (k.d.1906) ye. Gundê Zoqeydê dikeve navbera Misirc û Sêrtê. **Mela Reşîdê Comânî** ku xelkê wê deverê ye di çarçoveya edebiyata tekyayê de li ser Zoqeydî gelek helbest nivîsîne.

**Mela Ehmedê Heyderiyê** (k.d.1937) ku xelkê Dedeliya Patnosê ye, li Hîzanê li tekyaya Seyid Sibxetullahê Erwasî li cem Şêx Şehabeddîn xwendiye, di encama şerê cîhanê yê yekem de koçî Nisêbînê kiriye û li Sûriyeyê bûye pêgirtiyê Şêx Ehmedê Xeznewî ku ew jî xelîfeyê Şêx Diyaedînê Norşînî (kurê Şêx Ebdurehmanê Taxî) ye. Heyderî jî wek Seydayê Licî helbestvanekî girîng ê şaxa Nehrî ye. Ji bilî dîwaneke girîng menzûmeyeke eqaidê û munacatnameyek jî bi Kurdî nivîsîne.

**2. 2. Şaxa Basretê**

Basret navê gundekî ye ku berê bi Eruhê ve, niha jî bi Şirnexê ve girêdayî ye. Şaxa Basretê ya Xalidîtiyê ji aliyê Şêx Xalidê Cizîrî (k.d.1839) ve ku xelîfeyê dawî yê Mewlana Xalid e, li vî gundî hatiye avakirin. Şaxa Basretê li wîlayetên Şirnex, Sêrt, Batman, Mêrdîn, Diyarbekir û Kurdistana Sûriyeyê belav bûye.

Ji helbestvanên ku bi şaxa Basretê ve girêdayî yên herî zêde balê dikişînin helbestvanên malbata Aqtepê ne. Bi qeneeta me helbestvanên Aqtepî ne di çarçoveya şaxa Basretê tenê de, di çarçoveya hemû şaxên Xalidîtiyê de wek helbestvanên herî girîng û xweser dikarin bên dîtin. Pêşiyê malbata Aqtepê Şêx Hesenê Nûranî (k.d.1863), ji postnişînê tekyaya Basretê Şêx Salihê Sîpkî (k.d.1852) xelîfetî stendiye û piştî ku li Basretê perwerdeya xwe xilas kiriye li Aqtepê ku gundekî Çinara Diyarbekirê ye, tekyaya xwe ava kiriye. Piştî Nûranî bi rêzê kurên wî Şêx Evdirehman (k.d.1907) û Şêx Mihemed Can û kurê Şêx Evdirehman Şêx Mihemed Kerbelayî li tekyaya Aqtepê postnişînî kirine. Medrese û tekyaya Aqtepê ji damezirandina xwe heta bi bûyera Şêx Seîdê Palo (1925) bi awayekî aktîf li ser piyan mane. Piştî têkçûna bûyerê endamên malbatê hatine mişextîkirin, belawela bûne û medrese û tekya jî hatine girtin. Ji bilî her sê postnişînên navborî Şêx Eskerî û Şêx Hesîb jî endamên vê malbatê yên xwedî berhem in.

**Şêx Ebdurehmanê Aqtepî** (k.d.1907), dîwaneke girîng û berhemek bi navê *Rewdu'n Ne'îm*ê nivîsîne. *Rewdu'n Ne'îm*, di binemaya xwe de ji du berheman pêk tê. Ev her du berhem jî di tarîxa edebiyata Kurdî de berhemên yekemîn ên cureya şemail û mi'raciyeyê ne.

**Şêx Mihemed Can** (k.d.1909), ji bilî helbestên curbicur mesnewiyeke *Leyla û Mecnûn*ê nivîsiye. *Leyla û Mecnûn*a wî di tarîxa edebiyata Kurdî de yek ji girîngtirîn *Leyla û Mecnûn*ên Kurdî ye.

**Şêx Mihemed Kerbelayî** (k.d.1939), dîwaneke girîng û berhemek bi navê *Mirsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan)*ê nivîsiye. *Mirsadu'l-Etfal*a wî ferhengeke menzûm a Kurdî-Farisî ye ku di warê xwe de berhemek orjînal e.

**Şex Mihemed Eskerî** (k.d.1952), bi navê *Iqdê Durfam û Keşkol*ê du berhem nivîsîne. *Iqdê Durfam*a wî ji çîrokeke Kurdî ya folklorîk e û bi qasî ku tê zanîn, di tarîxa edebiyata Kurdî de yekemîn berhema serbixwe ya fablê ye. Keşkûla Şêx Eskerî jî berhemek e ku ji helbestên wî yên ku bi şêweyên curbicur nivîsîne pêk tê û ji bo keşkûlên Kurdî nimûneyeke girîng e.

**Şêx Hesîb** (k.d.1947) ji dîwaneke girîng nivîsîye

Çawa ku tê dîtin ji aliyê pênc helbestvanên Aqtepî ve bi giştî heşt berhem hatine nivîsîn. Du heb ji wan dîwanên klasîk in (dîwanên Şêx Ebdurehman û Şêx Kerbelayî) û herdu jî di asteke

bilind a edebî de hatine nivîsîn. Her şeş berhemên dîtir, di mijarên curbicur de hatine nivîsîn ku di tarîxa edebiyata Kurdî de di warên xwe de yekemîn in. Bi vê hilberîna edebî helbestvanên malbata Aqtepê di heman demê de ekoleke edebî jî saz kirine ku em wê wek ekola Aqtepê bi nav dikin. Damezirînerê vê ekolê Şêx Evdirehman e û neqşebendîtî, kurdîtî û elewîtî wek esasên bingehîn ê vê ekolê derdikevin pêş. Endamên ekola Aqtepê herweha di hunera helbestê de jî gelekî serkeftî ne. Şêx Evdirehmanê Aqtepî wek damezirînerê vê ekolê, çawa bandor li helbestvanên malbata xwe kiriye, bandor li helbestvanên dî jî kiriye ku hin ji wan ev in: Şêx Muhyedînê Hênî (k.d.1900) Mela Nesredînê Zoqî (k.d.1935) Mela Mihemed Nûrî Ewhedî (k.d.1977), Şêx Qutbedînê Korikî, (k.d.1979) û Mela Eliyê Baqustanî (k.d.2002).

Yek ji helbestvanên dî yê şaxa Basretê **Şêx Muhyedînê Hênî** (k.d.1897) ye. Bavê wî Şêx Ehmedê Karazî pêşî li Basretê ji Şêx Xalidê Cizîrî, piştre jî li Şamê ji Muhemmed el-Xanî xelîfetî stendiye. Sa'î berhemek li ser temaya xwarinê (cureya simatiyeyê) nivîsiye ku ev berhema wî di qada xwe de yekem berhema tarîxa edebiyata Kurdî ye. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de, piştî wî jî berhemeke wek wê nehatiye nivîsîn. Divê bê bibîrxistin ku di dawiya sedsala XIXem de li Hênê û Aqtepê nivîsîna helbestên bi temaya xwarinê wek bizaveke edebî derketiye pêş. Li Hênê Şêx Muhyedîn û li Aqtepê jî Şêx Ebdurehman û Şêx Mihemed Can nûnerên vê bizavê ne. **Şêx Mihemed Emîn** (k.d.derdora 1910an) jî neviyê Şêx Ehmedê Karazî ye û ji wî jî çend helbest gihîştine roja me.

**2. 3. Şaxa Tewîle/Beyara**

Tewîle li Kurdistana Başûr gundekî li ser Helebçeyê ye. Şêx Osman Siraceddînê Tewîlî (k.d.1866) ku xelkê Tewîlê ye û li Başûr xelîfeyê yekem ê Mewlana Xalid e, pêşî li Beyara ku gundekî nêzîkî Tewîlê ye, piştre jî li Tewîle tekyayên Xalidîtiyê vekirine. Lêbelê piştî wî Beyara bûye cihê rêveberiya vî şaxî. Ev şaxa Xalidîtiyê li Kurdistana Iraqê ji Silêmaniye heta bi Bexdayê û li tevahiya Hewramana Iraq û Îranê belav bûye û bandora wê gihîştiye heta bi Bakur jî.

**Mewlewî** (1882) ku dîwaneke orjînal bi Kurdiya Hewramî û eqaidnameyek bi navê "el-Eqîdetu'l-Merziye" nivîsiye yek ji nûnerên tesewufî yên Şêx Osmanê Tewîleyî. **Mela Hamidê Bîsaranî** jî katibê Şêx Osman e û derheqê wî de bi taybetî gelek helbest nivîsîne. Piştî Şêx Osman Sîraceddîn kurê wî **Şêx Omer Ziyaeddîn** (k.d.1900) li tekyaya Beyara dibe postnişîn. Wî bi mexlesa Feyzî helbestên erebî, farisî û kurdî nivîsîne. Yek ji helbestvanên girîng ê wê serdemê **Şêx Selîmê Sîneyî** (k.d.1914) jî bûye pêgirtiyê wî. Piştî Şêx Omer Ziyaeddîn **Şêx Necmeddîn** (k.d.1918)bûye postnişînê tekyaya Biyara ku ew jî helbestvanek e. Çawa tê dîtin tekyaya Beyara ji aliyê hilberîna edebî ve ciheki çalak e û divê bê zanîn ku li wê derê berhemên edebî bi Kurdiya Hewramî hatine dayîn.

Ji ber ku Mewlana Xalid xelkê Başûr e, bi awayekî siruştî bandora wî li ser edebiyata Soranî jî çê bûye û em dibînin ku du nûnerên girîng ên edebiyata Soranî ya klasîk endamên terîqeta wî ne. Yek ji wan **Mehwî** (k.d.1906) ye ku bavê wî Şêx Osman şêxekî Xalidî bû. Dema bavê wî koçî dawiyê kiriye Mehwî di şûna wî de bûye postnişîn. **Herîq** (k.d.1909), li Mukriyana Kurdistana Îranê ji Şêx Burhan xelîfetiya Xalidîtiyê stendiye û li Mehabadê li Mizgefta Seyîd Hesen nûnertiya Xalidîtiyê kiriye. Hem Mehwî, hem jî Herîq xwedî dîwan in û du helbestvanên herî girîng ê edebiyata Soranî ne.

Li Bakur nûnerê her girîng ê şaxa Tewîleyê **Şêx Se'îdê Meczûb** (k.d.1914/1916) e. Şêx Meczûb ku xwediyê dîwaneke girîng e û di dîwana wî de bandora Tewîleyê aşkera ye, ji Cizîra Botan, çûye Kurdistana Iraqê û li wê derê ji Şêx Elî Husamedîn (1939) xelîfetî stendiye. **Şêx Mihemedê Fersafî** (k.d.1892) jî xelîfeyê Şêx Osmanê Tawîleyî ye, lêbelê li ser daxwaza Şêx Osman, li tekyaya Basretê xelîfetî ji Şêx Salihê Sîpkî jî wergirtiye. Fersafî, ku ji bajarê Sêrtê ji gundê Fersafê ye, digel ku zimanê dayîka wî erebî ye jî, bi Kurdî çend menzûme nivîsîne.

## 3. PIŞTÎ ŞERÊ CÎHANÊ YÊ YEKEM

Çawa tê zanîn piştî şerê cîhanê yê yekem dawî li Dewleta Osmanî tê û li welatê Kurdan dewletên nû tên avakirin. Ji ber ku di vê qonaxê de li Tirkiyeyê medrese û tekya tên girtin û serdestiya dewletê xwe nîşan dide, serdestiya Xalidîtiyê ya berê ji holê radibe. Lêbelê di nav şertên zehmet de jî be, perwerdeya medreseyan dewam dike. Nifşên nû ku ji van medreseyan derdiçûn, medreseyên serbixwe ava dikirin û hêdî hêdî ji bin bandora Xalidîtiyê derdiketin. Bi awayekî siruştî di vê atmosferê de digel edîbên Xalidî, yên serbixwe jî derketine meydanê. Loma di qonaxa piştî şer de hemû helbestvanên klasîk ne di nav sîstema Xalidîtiyê de ne. Li vê derê em dê ji edîb û helbestvan Xalidî yên vê serdemê çend nimûneyan bidin.

Hin helbestvanên girîng ên şaxa Nehrî û berhemên wan ev in: **1. Mela Nûrullahê Godişkî** (k.d.2003): *Dîwan* el-*Hemail fi'ş-Şemail* (cureya şemailê), el-*Cewahiru'r-Reşadiye* (cureya siyerê), es-*Sebaik fi'l-Menasik*, *Çenta Yetîman*, *Kufru'l-Kebair*

(mijarên dînî); **2. Şêx Mihemed Emînê Heyderî** (k.d.2003): *Mewlûda Kurdî*, *Mewlûda Erebî*, *Eqîda Îmanê*, *Werdu'l-Etfal* û *Dîwan*; **3. Melâ Zâhirê Tendurekî** (1966): *Dîwan*; **4. Seydayê Hacî Fetahê Hezroyî** (k.d.1975); **5. Şêx Ismetullahê Karazî** (1996): *Dîwan*; **6. Mela Eliyê Baqustanî** (k.d.2002) *Dîwançe*, *Menzûmeya Sultan Şêxmûs* û *Mewlûd*.

Hin helbestvanên girîng ên şaxa Basretê û berhemên wan ev in: **1. Seyîd Eliyê Findikî** (k.d.1968): *Dîwan*; **2. Şêx Qutbedînê Korikî** (k.d.1979): (*Hediyyetu'l-Îxwan fî 'Eqîdeti'l-Îman*); **3. Mela Sîracê Xelîlî** (k.d.1983), *Dîwan*; **4. Şêx Sahibê Cizîrî** (k.d.1983): *Dîwan*, *Mewlûda Kurmanci*, *Eqîdeya Îmanê*; **5. Şêx Nûrullahê Cizîrî** (k.d.1985); **6. Mela Nezîrê Bedewî** (k.d.1986): *Dîwan*, **7. Şêx Mûsayê Şêxî** (k.d.1990), *Dîwan Sebîlu's-Selam fî Eqîdetî'l-Enam*; **8. Şêx Ehmed Hilmî** (k.d.2016): *Dîwan*

Ji endamên şaxa Basretê **Xelîfe Yûsifê Bazîdî** (k.d.1965), di vê serdemê de nûnerê herî girîng ê pexşana kurdî ye. Berhemên wî yên pexşan ev in: *Tuhfet-ul Amilîn*, *Îrşad-ul Îbad*, *Mecme'u'Leyla û Mecnûn-Mesailîş-Şer'iyye*, *Tuhfetu's-Sibyan*,*Tuhfetu'z-Zakirîn*,*Tecwîd*, *Eqîdeya Îmanê*. Berhema wî ya bi navê *Teqrîzê* jî menzûm e.

Di vê serdemê de **Seyîd Qedriyê Cizîrî** (k.d.1961) bi dîwana xwe ya girîng nûnerekî berbiçav ê şaxa Tewîleyê ye. **Şêx Munevverê Xunûkî** (k.d. 1977) û **Şêx Muşerrefê Xunûkî** (k.d.2008) jî şaxên Tewîle û Basretê bi hev re temsîl dikin. **Şêx Osmanê Duyem** (k.d.1997) ku postnişînê dawî yê şaxa Tewîleyê ye helbestvan e .

## Encam

Xalidîtiya ku wek bizaveke tesewufî, ne tenê di warê dîn de, di heman demê de di warên civak, perwerde, huqûq û siyasetê de jî bûye xwedî bandor, bi awayekî siruştî rengê xwe daye edebiyata Kurdî ya serdema xwe jî. Di qonaxa Xalidîtiyê de belavbûna edebiyata Kurdî hevterîbê belavbûna tekyayên Xalidîtiyê çê bûye û tekyayên Nehrî, Basret û Tewîle/Beyarayê wek sê şaxên sereke yên Xalidîtiyê ku li Kurdistanê ava bûne derdikevin pêş. Bi taybetî ji dawîlêhatina mîrektiyan heta bi şerê cîhanê yê yekem serdestiyeke tam a Xalidîtiyê heye. Piraniya edîbên Kurdan ên vê serdemê yan nûnerên Xalidîtiyê ne, yan jî pêgirtî û bawermendên wê ne. Lêbelê piştî şerê cîhanê yê yekem otorîteya Xalidîtiyê lawaz bûye û hevterîbê vê yekê êdî helbestvanên ne Xalidî jî derketine.

Xalidîti di tarîxa edebiyata Kurdî de ne bizaveke edebî ya lokal, yan jî ekoleke edebî ya temenkurt e. Dikare bê gotin ku ji derketina Xalidîtiyê heta bi roja me bi qasî du sed salî edîbên klasîk ên ku qet nebe di medreseyên Xalidiyan de ne xwendine kêm in. Ji vî aliyî ve edebiyata Kurdî ya serdema piştî mîrektiyan eger wek qonaxa Xalidîtiyê jî bê binavkirin ne şaş e.

Kojima berhemên edebî yên serdema Xalidîtiyê ji kojima berhemên edebî yên serdema mîrektiyan ne kêmtir e. Metnên edebî yên Xalidiyan ji aliyê hunerê ve serkeftî ne. Di serdema Xalidîtiyê de bi awayekî siruştî mijarên bi tekya û postnişînên terîqetê re têkildar di nav edebiyata klasîk de zêde cih girtine. Lêbelê helbestvanên Xalidî yên ku şêwaz û hunerên nû ceribandine û li ser tema û mijarên nû rawestiyane ne kêm in ku ekola Aqtepê ji bo vê yekê wek nimûneyeke girîng dikare bê dayîn. ●

## JÊDER


**Adak**, Abdurrahman , "Malbata Zêbariyan û Basreta "Paytexta Neqşebendiyan"-I -Heta bi Serdema Postnişîniya Malbata Zêbariyan li Dergahê Basretê-" *Nûbihar*, j. 107, Stenbol 2009.

**Algar**, Hamid , *Nakşibendilik*, (amd. A. Cüneyd Köksal), İnsan Yayınları, İst. 2007.

**Bruinessen**, Martin van, *Ağa, Şeyh ve Devlet*, Özge, (Wer. Remziye Aslan), İst.

**Cegerxwîn**, *Sewra Azadî*, Avesta, Stenbol 2002.

ez-**Zîbarî**, eş-Şeyx Muhammed Şefîq, *el-Ehwalu'd-Durriye we'l-Exbaru'l-Miskiyye fi's-Silsileti'z-Zîbariyye*, Musul 1935.

**Kavak**, Abdulcebbar, "Mevlânâ Hâlid-i Bağdadî'nin Halifelerinden Şeyh Osman Siracüddin et-Tavîlî (v. 1283/1866) ve Biyâre Medresesi/Tekkesi", Ataturk Universitesi İlahiyat Fakultesi Dergisi, j.: 43, Erzurum 2015.

**Korkusuz**, M. Şefik , *Nehri'den Hazne'ye Meşayihi Nakşibendi*, Kilim Matbaacılık, İst. 2010.

**Kürt Çalışmaları Grubu**, *Osmanlı Kürdistan'ı*, Bgst Yayınları, İstanbul, 2011.

**Muderris**, Mela Ebdulkerîm, *Yadî Merdan*, Întîşaratî Kurdistan, Senendec 1385, (b. I).

**Seyda**, M. Baki , Nakşî Halidî Seydaî Postnişînler, www.seydayi-ciziri.com

**Zeki Beg**, Muhammed Emin , *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2012.


## TÊBINÎ

Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Serokê Beşa Ziman û Çanda Kurdî.

2 Muhammed Emin Zeki Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2012, r. 710

3 Kürt Çalışmaları Grubu, *Osmanlı Kürdistan'ı*, Bgst Yayınları, İstanbul, 2011, r. 28-30.

4 Mela Ebdulkerîm Muderris, *Yadî Merdan*, Întîşaratî Kurdistan, Senendec 1385, b. I, r. 7-126; Hamid Algar, *Nakşibendilik*, (amd. A. Cüneyd Köksal), İnsan Yayınları, İst. 2007, r. 232-252; 505-511; Abdulcebbar Kavak, Mevlana Halid-i Nakşıbendi ve Halidilik, Nizamiye Akademi, ist. 2016

5 Abdurrahman Adak, "Malbata Zêbariyan û Basreta "Paytexta Neqşebendiyan"-I -Heta bi Serdema Postnişîniya Malbata Zêbariyan li Dergahê Basretê-" *Nûbihar*, j. 107, Stenbol 2009, r. 27-32.

6 Kavak, h.g., r. 264.

7 Ji bo agahiyên berfireh derheqê şaxa Nehrî de bnr. M. Şefik Korkusuz, *Nehri'den Hazne'ye Meşayihi Nakşibendi*, Kilim Matbaacılık, İst. 2010, r. 11-38.

8 Cegerxwîn, *Sewra Azadî*, Avesta, Stenbol 2002, r. 151-153.

9 Ji bo agahiyên berfireh derheqê şaxa Nehrî de bnr. eş-Şeyx Muhammed Şefîq ez-Zîbarî, *el-Ehwalu'd-Durriye we'l-Exbaru'l-Miskiyye fi's-Silsileti'z-Zîbariyye*, Musul 1935; M. Baki Seyda, Nakşî Halidî Seydaî Postnişînler, www.seydayi-ciziri.com; Abdurrahman Adak, "Malbata Zêbariyan û Basreta "Paytexta Neqşebendiyan"-I -Heta bi Serdema Postnişîniya Malbata Zêbariyan li Dergahê Basretê-" *Nûbihar*, j. 107, Stenbol 2009, r. 27-32.

10 Mela Ebdulkerîm Muderris, *Yadî Merdan*, Întîşaratî Kurdistan, Senendec 1385, b. I, r. 7-126; Abdulcebbar Kavak, "Mevlânâ Hâlid-i Bağdadî'nin Halifelerinden Şeyh Osman Siracüddin et-Tavîlî (v. 1283/1866) ve Biyâre Medresesi/Tekkesi", Ataturk Universitesi İlahiyat Fakultesi Dergisi, j.: 43, Erzurum 2015, r. 260-285.